Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1253 5-Adar-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Ji bo 8’ê Adarê diyariya Klîba “Jina Sûrî”

Navenda Nûçeyan

**Di bin navê “Jina Sûrî” de, Navenda Hîlala Zêrîn amadekariya klîbekê derbarê têkoşîn û berxwedana jina Sûrî de dike. Ev klîp jî di 8’ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê de wê were pêşkêşkirin.**

Bi boneya 8’ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê, Navenda Hîlala Zêrîn amadekariya xwe ji bo derxistina klîbekê bi navê ‘Jina Sûrî’ dike. Klîp li kantona Tebqa ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat kişandin û li navenda Serdem a kantona Hesekê nêzî mehekê hate tomarkirin. Klîp bi beşdariya 28 endamên jin hatiye amadekirin. Tê de komên govendê, stran û Koma defê jî hene. Klîp balê dikşîne ser têkoşîn û berxwedana jina Sûrî, di heman demê de peyameke ji her jineke ku ji bo pêşerojeke baştir li berxwe dide ye. Rêveber û endamên Hîlala Zêrîn der barê klîpa “’Jina Sûrî’ û amadekariyên wê ji ajansa NÛJINHA re axivî.

**‘Klîp dê bibe dengê jinên Sûriyeyê’**

Serpereştyara tîmên teknîkî li Navenda Hîlala Zêrîn Mîdiya Silêman armanca çêkirina klîbê û amadekariyên wê wiha anî ziman: “Sûriye di van demên dawî de şahidiya gelek guhartinên siyasî dike. Ev guherîn jî bandorê li ser rastiya jinan dike. Rolên wê yên di civakê de piştguh dike. Fikra klîbê jî ji vê guherînê derket. Armanca me; em peyama ‘jin di qadên civakî de rol bilîze, bi taybetî jî di qada hunerî de’ ji cîhanê re ragihînin. Li kêleka wê em dixwazin bi riya vê klîbê tecrûbe û destkeftiyên jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî bighînin Sûriyeya nû. Nêzî mehekê amadekarî ji klîbê re hat kirin. Nivîsandina stranê û sazkirina wê, bi koma Keziyan a defê, koma Palmêra ya govendê û koma Hêlîn Cûdî ya stranan re pêk hatin. Di klîbê de 28 jin cîh digrin.”


Mîdiya Silêman

**‘Klîp wê di 8’ê Adarê de bê pêşkêşkirin’**

Mîdiya Silêman destnîşan kir ku hemû cilên di klîpê de hatine lixwe kirin, tevahiya çandên Sûriyeyê di nava xwe de dihewînin û wiha got: “Cilên filklorî ku hatine lixwekirin, temsîla çanda her pêkhateyekê dike û weke tabloyek mozaîk rengên pêkhateyên herêmê nîşan dide. Ji bo kişandina klîbê Keleha Cebar hate hilbijartin. Ji ber ku ew cihekî dîrokî ye û çanda herêmê vedibêje. Em vê stranê diyarî hemû jinên Sûriyeyê yên têkoşer û berxwedêr dikin. Bi taybetî jina Rojavayî ku niha li Bendava Tişrînê berxwedana dîrokî dinvîse. Ev stran dê di 8’ê Adarê de bê pêşkêşkirin û berxwedana jina Sûrî ji cîhanê re bê vegotin. Huner peyameke ji bo gihandina deng û rengê jinan e. Em bi hêvî ne ev klîp bighê armancên xwe.”

**‘Stran hûrgiliyên jina Sûrî vedibêje’**


Îlav Şêx Muhemed

Endama koma stranan Îlav Şêx Muhemed diyar kir ku dixwest mohra xwe ya hunerî li vê klîpê bide û wiha got: “Min xwest mohreke min di vî karî de jî hebe û tecrûbeya xwe pêşkêş bikim. Di vê stranê de dîroka jinên Sûriyê, rastî û hemû hûrgiliyên wê tên vegotin. Di heman demê de balê dikşîne ser têkoşîn û berxwedana jinê ya li hember tengasiyan. Hebûna jinê û beşdariya wê ya ji hunerê re, gelek girîng e. Ji ber ku huner bi hurgiliyê jinê nûjen dibe. Tevî kêşeyên ku me di kişandina klîpê de dîtine jî, me hewl da ku em vî karê xwe bi serkeftî derbas bikin. Em hêvî dikin ku ev stran bibe dengê jina Sûrî ji cîhanê re.”

**‘Bi riya stranê dixwazin dengê jina Sûrî ragihînin’**

Endama koma defê Mîdiya Ibrahîm jî girîngiya vê klîpê anî ziman û wiha axivî: “Amadekirina klîpeke bi vî rengî, li herêmê gelek cuda ye. Ji ber ku Reqa di pêvajoya DAIŞ’ê de gelek êş, azar û binpêkirin dît. Her wiha adet û kevneşopiyên paşverû jî hişt jin di çarçoveya malê de bimîne û beşdarî qada hunerî nebe. Ji ber vê yekê me xwest bi riya vê stranê dengê jinên herêmê û asta wê ya hunerî ragihînin. Ez hêvî dikim ku wek jinên Rojava, mohrek û hebûna me di Sûriyeya nû de di warê hunerî de hebe.”


Mîdiya Ibrahîm

**‘Hêvîdar im ev klîp bibe cihê piştevaniyê ji jinan re’**

Endama koma govendê Ceylan Silêman jî derbarê beşdariya xwe ya di klîbê de wiha got: “Min ji fikirê şêwaza klîbê gelek hez kir. Ji ber vê yekê min xwest hebûna xwe di vê klîbê de îsbat bikim. Em bi govenda xwe beşdarî klîpê bûn. Em dixwazin ev klîp û karên me bibin cîhê piştevaniyê ji bo jinên ciwan da ku karibin di hunerê de rola xwe bilîzin. Divê her jinek ciwan ku hebûna xwe di hunerê de dibîne, beşdarî navenda Hîlala Zêrîn bibe.” **NÛJINHA**


Ceylan Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

**Mêvan ji mêvan ne xweş e, malxwê malê ji her duyan ne xweş e:**
- Dema du kes li cem yekî din rastî hev werin û keyfa wan ji hev re neyê hingê tê gotin.
**Nan li vir nema:**
- Naxwazin ez li vir bisekinim; ji min hes nakin; karekî ku ez li vir bikim nîne.
**Nanê min li vir nema:**
- Bi heman wateyê.
**Sertilî wir ve paşpehnî vir ve:**
- Dema mirov ji yekî hes neke û bi devereke dûr ve biçe hingê tê gotin.
**Xal Xidiro her roj li viro:**
- Dema yek pir diçe cihekî lê xwediyê cih nexwaze hingê dibêje.
**Xidiro her roj li viro:**
- Bi heman wateyê.
**Xwîna wî tehl e/xwîntehl e:**
- Ne xwînşîrîn e; ne xweşik e; jê nayê heskirin.

**LI SER BETALIYÊ**

**Beqan dixesîne:**
- Ti karî nake; betal e.
**Gêsinê bêkar zeng digire:**
- Ji bo xirabiya bêkariyê tê gotin.
**Ji betalî bi serê kîre xwe dilîze:**
- Ti karî nake; betal e.
**Ji betalî kera bavê xwe da ber dasan:**
- Bi heman wateyê.
**Ji betalî kera bavê xwe da ber keran:**
- Bi heman wateyê.
**Kêr di kalanê xwe de zeng digire:**
- Ji bo xirabiya bêkariyê tê gotin.
**Kolankut e:**
- Betal e; ti karî nake; ji kar direve.
**Ma ez beqan dixesînim:**
- Ez ne betal im; karê min jî heye.
**Ma ez keran dixesînim:**
- Bi heman wateyê.
**Ma ez şêliman dişûm:**
- Bi heman wateyê.
**Weke yê ji betalî das li serê kîrê xwe dayî:**
- Dema yek ti karê wî bi tiştekî tinebe û pê bileyze heta ku xirab bike hingê jê re tê gotin.

**LI SER KAR Û KIRYARÊN SER HÊZÊ RE**

**Beqê req hilgirt:**
- Dema yek karekî ser hêza xwe re digire ser xwe hingê tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

📷 Bi kamîreya Hemza Sêvo



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1253 5-Adar-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Jin Jiyan Azadî bûye xemla 8’ê Adarê




Endama Meclisa jin a Malbatên Şehîdan a bajarê Qamişlo Foza Yûsif diyar kir ku Roja 8’ê Adarê tê wateya azadî, hebûn û nasnameya tevahî jinên cîhanê û got: “8’ê Adarê roja Azadiya jinê ye.” **R-2**

## Remzî Kartal: Encama pêvajoyê nexşerêya gelên azadîxwaz e



Hevserokê Kongra Gel Remzî Kartal diyar kir ku hevdîtinên li gel Rêber Abdullah Ocalan pêk tên, encama têkoşîna gelan e û wiha got: “Ji bo ev têkoşîn bighê encamê pêwîst e em xwe bighînin hemû aliyan û nexşerêya Rêber Apo baş fêm bikin.” **R-4**

# BANGA RÊBER APO NEXŞERÊYA AŞTÎ Û DEMOKRASIYÊ YE

Di 27’ê Sibatê de şandeya DEM Partî bi Rêber Abdullah Ocalan re li girtîgeha Îmraliyê hevdîtin pêk anî. Piştî hevdîtinê civîneke çapemeniyê li bajarê Stenbolê hat lidarxistin û tê de banga dîrokî ya Rêber Abdullah Ocalan hat xwendin. Ev banga ku bi milyonan kes li bendê bûn. Ev bang dîrokî hat binavkirin û bû derfeta pêkanîna aştiyê li Tirkiyê û tevahiya herêmê. **R-3**




## Muzîka kurdî li Cizîrê di serdema kevnar û îroyîn de



Muzîka kurdî li Cizîra Rojavayê Kurdistanê muhra xwe li dîroka çanda muzîka kurdî xistiye. Bilûrvan Cemal Sarîk jî da zanîn ku hunermendên kurd neçar diman ku di bin siya muzîk û hunerê de, êş û azarên xwe derbirîn bikin û wiha got: “Da ku muzîk bê parastin û pêşxistin pêwîst e perwerde ji bo fêrkirina amûrên kevnar ên çanda kurdî, bên dayîn.” **R-7**

## ‘Pêwîst e welatî jî di paqijiya bajêr de bi me re alîkar bin’



Rêveberê Ofîsa Beşa Paqijiyê ya Şarerdariya bajarê Qamişlo Mihdî Eqîl diyar kir ku ew li gorî derfetên xwe rojane taxên bajêr paqij dikin û got, “Ev heftiyeke ku karê me di asteke herî baş de tên meşandin û me pirojeyên xwe yên dema pêş hildana û li hêviya erêkirinê ne.” **R-6**

## “Ji ber ku bajarê me dagirkirî ye, barê me duqatî ye”

Di demeke ku tevahiya gelê kurd li çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê li benda peyama Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan bûn, dewleta Tirk a dagirker dengekî dîtir ê rastî û heqîqetê soyqest dike û carek din hewl dide tirsa xwe ya ji dengê rastiyê bi êrişa bi ser rojnamevanan ve veşêre. **R-5**



**Ne aştî, jin demokrasiyê dixwaze** — Nehîr pale R-2

**Di pirsgirêka Kurd de çek ji holê tê rakirin** — Zekî Bedran R-5


**Nexşerêya serdema nû** — Farûk Sakik R-5


**Civaka ku jin têde ne azad e!** — Rohat Bulut R-6

# Jin Jiyan Azadî bûye xemla 8’ê Adarê

Endama Meclisa jin a Malbatên Şehîdan a bajarê Qamişlo Foza Yûsif diyar kir ku Roja 8’ê Adarê tê wateya azadî, hebûn û nasnameya tevahî jinên cîhanê û got: “8’ê Adarê roja Azadiya jinê ye.”

**Dîlan Mulhim\ Qamişlo**

8’ê Adarê roja Cîhanî ya Jinan rojeke navneteweyî ya jinên kedkar e. Di sala 1857’an de Neteweyên Yekbûyî roja 8’ê Adarê weke Roja Cîhanî ya Jinên Kedkar pejirand. Herwiha 8’ê Adarê, li hevhatina rengên jinê yên ji xemla Biharê ye; jina ku bi hêza xwe ya hûndirîn û bi êradeya xwe tê naskirin, di hundir pergala desthilatdar de hate fetisandin û tunekirin. Bûyera 8’ê Adarê jî yek ji ew hêza ku hişmendiya desthilatê redkiriye ye. Her sal li seranserî cîhanê 8’ê Adarê weke roja jinan a cîhanî tê pêşwazîkirin. Armanca vê rojê balkişandina li ser keda jinê û hevsengiya di navber her du cinsan de û bê mafiya sîstema desthilatdar a li cîhanê ye.

Derbarê roja Cîhanî ya Jinan 8’ê Adarê Endama Mecilsa jina ya Malbatên Şehîdan a bajarê Qamişlo Foza Yûsiv ji Rojnameya me re axivî.






**`8’ê Adarê roja têkoşîna jinê ye`**

Foza anî ziman ku 8’ê Adarê tê wateya roja azadiya jinê û wiha got: “Roja 8’ê Adarê tê wateya azadî, hebûn û nasnameya tevahiya jinên li cîhanê, di tevahiya cîhanê de jinê bi riya nasnameya xwe cihê xwe di her qadê de girt. Herwiha di encama têkoşîna şoreşa jina Kurd û dengvedana wê di cîhanê de, her sal jinên cîhanê vê rojê dibin diruşmeya `jin jiyana Azadî` de pîroz dikin, ji ber ku di wê rojê de hêz û felsefeya jinê hate avakirin. Li ser wî mîrasî jinên cîhanê wê rojê pîroz dikin û hebûna xwe di her qadê de didin diyar kirin. Bi hatina vê rojê pêwîste jin di her qadê de berxwedan û têkoşînê bide meşandin û bi taybet jî li Bendava Şehîdan. Ji bo ku em wateyeke mezin bidin Roja 8’ê Adarê û banga xwe bigihînin tevahiya Cîhanê, li her cihî sînoran rakin û çi jina ku tundî li ser tê kirin dengê xwe bigihînin cîhanê. Di heman demê de wekî ku tê zanîn 8’ê Adarê mîna roja jinên kedkar yên cîhanê tê naskirin. Li New Yorkê ji bo bidestxistina mafê xwe 129 jinan berxwedaneke dîrokî kirin. Li Kurdistanê jî bi derketina tevgera jinên berxwdêr re û bi saya ked, lehengî û wêrekiya wan, bi taybetî yên mîna hevala Sakîna Cansiz, Bêrîtan Zîlan û Arînan, herwiha yên şehîd bûne dîroka jinê hat nivîsîn û em ê heta dawiyê xeta wan bişopînin.”

**‘Pêwîste jin li gorî zagonên xwe tevbigere’**

Foza Yûsiv eşker kir ji bo ku jin bighêje azadiya xwe pêwîste her tiştên xirab ji jiyana xwe rake û wiha bi dawî kir: “Ji bo ku jin bigêje azadiya xwe pêwîste li gorî rêgez û zagonên exlaqî tevbigere, azadî ewe ku her tiştê xerab di dilê xwe de rake. Rêber Apo dibêje “min zilamtî di xwe de kuşt” jin jî çi tiştên ne rast ji destpêkê heta roja îro, ji aliyê civak û dewletên kapîtalîzim ku felsefeya xwe li ser jinê didin meşandin, ji bo ku jin azad be. Herwiha ji bo ku jin bighêje azadiya xwe pêwîste jin xwe birêxistin bike û rêxistina xwe berferh bike, dengê xwe bighîne tevahiya jinên li cîhanê.

Di heman demê de banga me ji tevahiya jinên cîhanê re heye ku çi tundiya li ser tê meşandin li hemberî wê bê deng nemîne û daxwaza azadiya mafê xwe bike. Herwiha jina ku tundî û destdirêjî li ser tê meşandin, pêwîste dengê xwe bighîne rêxistinên jinan. Ji ber ku rêxistinên jinan gelek hene ku mafê jinê diparêzin, herwiha berxwedan û tevgera jina azad cara yekemînine li Rojhilata Navîn bi fikir û felsefeya Rêber Apo xwe gihandiye asta herî bilind. Ji ber vê yekê pêwîste tevahiya jinên li kurdistanê destekê bidin jinê Rojhilata Navîn, ji bo ku bighêjin azadiya xwe.”

## Ji Pênûsa Jin

### Ne aştî, jin demokrasiyê dixwaze

**Nehîr Pale**

Ji bo jinê gelek cûdayî di navbera têgîna aştî û demokrasiyê de heye. Li gorî zîhniyeta dagirkeran aştî zeyîfatî ye û wê çima jin xwe bixe rewşeke ku lewaz lê were meyzandin. Li Bakur û Başûrê Kurdistanê û Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jin li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ber xwe dide û radest nabe. Niha li girtîgehên Îranê jî jina Faris, Kurd li dijî sîstema dewletê li ber xwe didin. Di pêvajoyên herî giran jina şervan, şoreşger, siyasetmedar û hwd. xwe nedaye paş û berpirsyartî rakiriye.

Sîstemên dagirker fêrbûne ku jinê di rewşeke lawaz de bibînin û wê li gorî berjewendiyên xwe bikar bînin. Di zîhniyeta mêr de jin amûre û wexta karê wan pê xilas dibe êdî navên dûrî exlaq lê dikin û di civakê de cih jê re namîne.

Ji bo jinê hîna ew wext nehatiye ku gotina aştiyê bikar bîne, li ser asta cîhanê polîtîka qirkirinê li ser jin tê meşandin. Di cîhanê de tu zagon û rêzik nînin heyanî ku jin xwe pê biparêz in. Ji xwe zîhniyet nayê guhertin û exlaq tenê bi namûs û şerefê ve hatiye girêdan. Di van şert û mercan de wê jin ji bo çi têgeha aştiyê bikar bîne yan jî têxe rojeva xwe de. Tevgerên jin ev bi sala ye ku li hemberî zayendperestiyê têdikoşin. Gav bi gav dîroka xwe dinivîsînin, lêkolînan dikin û li çareseriyê digerin.

Rêber APO roja 25`ê Şibatê 2025`an dest bi pêvajoya guhertin û veguhertina demokratîk kir. Ev pêvajo ji aliyê zîhniyet, siyasî, civakî, aborî, huner û exlaqî ve guhertinê dixwaze. Bi taybet pêdiviya jinê bi pêvajoyê heye û parçeyek ji têkoşîna wê ye. Di vê pêvajoyê de cih ji têgeha aştiyê re nîne, ji berê zêdetir wê têkoşîna azadî û demokrasiyê were kirin. Eger jin aştiyê ji dewletê hêvî bike, wê bikeve xefka sîstema dagirker de û têkoşîna ku destpêkiriye nîvço bimîne. Dîroka xwe nivîsandin, nirxên xwe yên madî û manewî vegerandin û parastin, hevpeymana jin a civakî amade kirin û jin ji pencên mêr rizgarkirin hemû gavên ku pêdiviya jin pê heye.

Pêvajoya Rêber APO destpêkiriye ji bo jinê şensekî têkoşînê yê xurt e, em nikarin bi têgeha aştiyê îfade bikin. Li Sûrî û Tirkiyê xebatên jin ên siyasî û rêxistinî dikarin bighîjin asta herî bilind. Li tevahiya cîhanê jin êdî nema zilmê li ser xwe qebûl dikin û ketine nava lêgerîna azadiyê de. Bi riya Tevgera Jin gelek tecrûbeyên jin ên rêxistinî û siyasî hene. Mînak li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Kongra Star, Meclisa Kombûna Jin a Sûriyê û Desteya jin a Rêveberiya Xweser reşnivîsa Hevpeymana jin a civakî amadekirin e. Hevpeymana jin a civakî yek ji rêbazên guhertin û veguhertina demokratîk e, di vê xebatê de daxwazên jin ên edaletê, wekhevî û azadiyê wê jiyanî bibin. Têgeha aştiyê bikar anîn dibe ku bibe sedema xebatên jin gelekî zeyîf bibin. Rêbazên xebatê yên kevn têrê nakin ku têkoşîna jin a li hemberî zeyendperestî bighîjin encamê. Ji ber di pêvajoya guhertin û veguhertina demokratîk de berpirsyartî ji jinê tê xwestin.

# ‘8’ê Adarê rojeke girîng û watedar e’

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Rêveberiya Kongira Star a bajarê Dêrikê Wefa Elî diyar kir ku 8’ê Adarê ji bo jinan wek rojeke pîroz, xwedî wateyeke cûda û watedar e. Wefa Elî da zanîn ku azadiya jin bi parastina fikrê Rêber Apo pêkan e û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo armanca jinên azadîxwaz e.**

Di 8’ê Adara sala 1857’an de jinan li New Yorkê xwepêşandan kirin. Jinan daxwaz kiribûn ku saetên wan yê kar dakevin 8 saetan û nirxê karê wan jî wekhev be û ne kêmtir be ji yên mêran. Lê belê di encama garavê de kargeha jinan hate şewitandin û bi qasî 100 jinî jiyanan xwe ji dest dan. Ev bûyer muhra xwe li guhartina zihniyeta zilam xist û weke gavên destpêkê yên jinê ber bi bidestxistina mafê xwe ve bû.

Derbarê wateya 8’ê Adarê û hestên jinan piştî nameya Rêber Apo Rêveberiya Kongira Star a bajarê Dêrikê Wefa Elî ji Rojameya me re axivî.

**Şopandina xeta Rêber Apo**

Wefa Elî da zanîn ku di demên borî de pergala mêrê serdest tu qedir nedidan hebûna jinê, ew tenê wek amûreke anîna zarok û karê malê didîtin û wiha domand: “Bi saya fikir û ramanên Rêber Apo û piştî Şoreşa 19’ê Tîrmehê êdî jin bû xwedî maf û xwedî helwest. Jin xwe naskir û karî bibe pêşeng ji civakê re. Her wiha jinê dest bi kar û xebatê kir û karî ji civakê re isbat bike ku ew jî dikare cihê xwe di hemû qadan de bigre û bibe pêşeng. Her sal 8’ê Adarê derbas dibe em dibêjin îsal ji ya borî xweştir bû, lê ji bo me îsal saleke pîroz bû ji ber ku ji 15’ê Sibatê heya roja îro bajarê Dêrikê bi heyecaneke mezintir tevger kirin, bi taybet piştî peyama Rêber Apo. Di heman demê de jî Rêber Apo silav ji Rojavayê Kurdistanê re rêkirbûn û bi taybet jî ji bo jinan.



Ew kar û pirojeya ku Rêber Apo dest pê kirbû me dît wek erkekî li ser milê jinan ku berdewam bikin. Berdewamkirina vî karî jî bi riya şopandina xeta Rêber Apo û xeta jina azad e. Niha Rojava û giştî Sûriyê di qonaxeke hestiyar re derbas dibe, li gorî pêvajoyê jî pêwêste jin têkoşîna xwe bilindtir bikin.”

**`Pêwîst e 8’ê Adarê bi coş were pêşewazî kirin`**

Rêveberiya Kongira Star a bajarê Dêrikê Wefa Elî axaftina xwe wiha qedand: “Jin tam azad nebûye û gelek kes hene çi jin çi zilam wateya azadiyê hîn fêm nekirine, pêwîste jin di hişmendî, kar, nasname û bi çanda xwe azad bibe. Azadiya me bi parastina fikrê Rêber Apo ye, azadiya me bi parastina rê û rêbazên ku Rêber Apo ji bo me deynaye. Piştî nameya Rêber Apo jin hestiyar bûn bi taybet dema wêneyê Rêber Apo dîtin her jineke ku xeyala dîtina wî dikir rondik ji çavên wan bariyan. Pêşwaziya 8’ê Adarê wê ji salên borî bi coştir bê. Wê bi dana semîner, perwerde, serlêdana saziyan û bi çalakiyên cûr bi cûr wê were pêşwazî kirin, niha hemû jin ketine kêferatê de û her jin ji bo vê roja pîroz xwe hazir dike ku bikaribin bi rengê xwe nameyê bighînin Rêber Apo ku li ser fikir û felsefeya wî ne û bi xeta şehîdan ve girêdayîne. Hêviya me wek jin azadiya Rêber Apo ye, ji ber ev xeyalê her jinekî ye, ji ber ku ew pêşengê me ye. Di heman demê de hêviya me ew e ku Sûriyeke demokrat û wekhev were avakirin.”



# Muzîka kurdî li Cizîrê di serdema kevnar û îroyîn de

Muzîka kurdî li Cizîra Rojavayê Kurdistanê muhra xwe li dîroka çanda muzîka kurdî xistiye. Bilûrvan Cemal Sarîk jî da zanîn ku hunermendên kurd neçar diman ku di bin siya muzîk û hunerê de, êş û azarên xwe derbirîn bikin û wiha got: “Da ku muzîk bê parastin û pêşxistin pêwîst e perwerde ji bo fêrkirina amûrên kevnar ên çanda kurdî, bên dayîn.”

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Li Rojavayê Kurdistanê, kantona Cizîrê warê herî navdar e bi muzîk, tembûr, kemançe, dahol, zirne û hemû amûrên çanda kurdî.

Di derbarê rewşa muzka kurdî ya kantona Cizîrê, me reportac bi Cemal Sarîk re di 16’ê adara 2024’an de çêkir.

**Rewşa muzîka kurdî li kantona Cizîrê berî salên 2000’î**

Bilûrvan Cemal Sarîk, ê bi temenê xwe 65 salî ye ku ji gundê Dugirê yê girêdayî navçeya Tirbespiyê ye rewşa muzîka kurdî wiha şîrove kir. Muzîk pir kevinar e, li gorî ku min xwendî û lêkolîn kiriye, di destpêkê de, muzîk weke benca bijîşkan hatiye bikaranîn, ji ber ku di destpêkê de derman û pêşketina zanistî, ne li pêş bû, muzîk di dema dermankirin ango dirûtina laşê mirov ji bo birînan muzîk dihat bikaranîn. Herwiha da ku karibin mirov derman bikin, muzîk bi vî rengî dihat bikaranîn û dîroka muzîkê vedigere hazarên salan. Mûzîka kurdî bi dirêjahiya dîrokê re, li cem şivanan dest pê bûye. Dîroka muzîkê li gorî hin lêkolînan ji amaûra bilûrê dest pê kiriye, herwiha kemançe, dahol û zirne. Di şahî û govend, sinetkirin û hwd de mûzîka kurdî hatiye bikaranîn, piştî van amûran, amûrên têlî mîna tembûr, biziq û ûd û hwd derketine.



**Şêwazê muzîka kurdî û bikaranîna wê di zemawendan de**

Gelê kurd bi rengekî giştî ji sed salî û vir de muzîk û stranên kurdî pêşxistine, ji ber rewşa ku kurd û welatê kurdan têr re derbas dibû, di nava gel û civaka kurdî de, gelek qedexekirin, di warê ziman, çand, muzîk û mafê rewa ji aliyê desthilatdaran ve hebû. Desthilatdarên Kurdistanê nedihiştin gelê kurd bi rihet tevbigerin, baxifin û bistirên. Ji ber vê yekê jî kurd neçar diman ku di dibin siya muzîk û hunerê de, êş û azarên xwe derbirîn bikin. Bi riya dayikan, mûzîkjenan sitranên ku di ber çandiniyê re dihatin gotin û huremendan re muzîka kurdî pêşketiye. Bi rastî ger ne ji hunermend û dayikên kurdan ba, wê niha zimanê me jî bihata pişaftin, lê ji ber keda wan ku bi awayekî veşartî tevî hemû zor û zehmetiyan dihat kirin, ev ziman îro roj hatiye parastin. Min hunermend Mihemed Şêxo çar caran dîtiye û min têkiliyên hunerî pêre kirine. Cara yekemîn ku min huermend Mihemed Şêxo dîtiye, li Gundê Elî yê girêdayî Tirbespiyê bû, wî li wir zemawendek lidarxist di wê demê de herî dawiya ji dema şahiyê min jî bi tembûra Mihemed Şêxo govand gerandiye. Wê demê temenê min 12 sal bûn, ev yek jî vedigere nêzî 50 sal berî niha. Civaka me civakeke kurdî û geş bû şahiyên me li tax û bênderanên gundan bûn, ne mîna niha ku li holên nûjen bûn, di wê demê de lukis hebûn ku li gundan lukis û fanos datanîn, di şahiyan de kemançe, dahol û zirne bûn. Bi wan govend û şahî digeriyan, gel her dem kom dibû li wê şahiyê bêyî ku bihata vexwendina wê şahiyê jî lê dîsa tevlî wê dibû. Rola civaka kurdî di lihevgerandina gel û şahiyan de hebû, hunermendên me yên weke Mihemed Şêxo, Se`îd Yûsiv û hwd. di wê serdemê de her dem nêzî dilê civakê bûn.

**Hevrûkirin di navbera salên piştî 2011’an û beriya wê**

Bilûrvan Cemal di derbarê vê xalê de wiha anî ser ziman: “Beriya şoreşa Rojava ango berî 13 salan deweltê û rêjîma Baas nedihiştin ku em herin cejnên Newrozan an jî bi kurdî biaxivin an stran û awazan bi kurdî bêjin. Lê ji 13 salan û bi şûn de pêşketineke pir mezin di warê çand û hunera kurdî de çêbûye, navendên muzîkê ji bo perweredekirina muzîka kurdî li tevahiya kantona Cizîrê çêbûn. Êdî hin bi hin pêşketin di warê muzîka kurdî de çêbû, lê dîsa ne weke ku tê xwestin e, ji ber ku em dibînin hin amûrên muzîkê yên kevnar ji çanda kurdî di asteke kêm de tên bikaranîn. Weke amûra zirne, kemançe, bilûr û hwd, niha jî di zemawend û şahiyên curbecur de li şûna wan teknîka muzîka nûjen a ku xweşiya dengê muzîka resen a van amûran winda dike, tê bikaranîn.



**Pêşxistna muzîka kurdî li herêmê**

Cemal Sarîk têkildarî pêşxistina muzîka kurdî û parastina wê ji windabûnê wiha anî ser ziman: “Ez her dem rexnê li aliyê têkldar yên li ser navendên çand û hunerê, dikim, tînim ser ziman û dibêjim ku mamosteyên deng yên ku amûran bidine fêrkirin, kêm in. Bi taybet em dixwazin ku li navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ku weke navendeke sereke rola wê di parastina çandê û pêşxistina muzîka kurdî de heye, pêwîste kesên bispor di qada muzîkjeniyê de pirtir bikin. Armanc jê ew e ku endamên navendê û her kesê ku bixwazibe bibe muzîkjen, bidin fêrkirin. Ev yek jî ji bo em muzîk û hunera kurdî li pêş bixin û bighêjin asteke cîhanî. Ev asta hunerî ya ku îro roj em gihajtinê vedigere kesên me yên dengbêj ku hemû dengbêjiya wan ji bûyerên serpêhatî pêk dihatin. Ew dengbêjên berê xwediyê qenciyê ne. Ger em bi rengekî bispor li dengbêjiya wan kesan binêrin em dikarin bikin flim û bidin jiyankirin ku weke mînak dibêje ji bajarê Dêrkê Slo Koro hebû ku wî dikarîbû bi seatan dengbêjî bikiraya. Di heman demê de Evdilo jî li bajarê Qamişlo hebû ku li aliyê Tirbespiyê bû ew jî roleke pir girîn di warê parastina huner û folklora kurdî de lîstiye. Rola amûrên foloklorî yên ji çanda kurdî, stran û dengbêjiya kurdî di dîrokê de ji bo parastina kelepûra kurdî gelekî li pêş bû. Mîna kemançe, def, dahol û zirne. Me didît ku çawa hunermendê me bi amûrên muzîk û dengê xwe ji demê kevin ve çawa destan, stran, çîrok û foloklora kurdî parastin. Lê di dema niha de piştî amarên nûjen derketine, rola wan pir kêm bûn. Da ku ev amûr werin parastin û neyên pişaftin, divê aliyên berpirsiyar û muzîkjenên me yên kurd, biparêzin û ji wisa bêhtir bikar bînin û bidin vejînkirin.”

# ‘Em hunermedên civakê ne pêwîst e em xwedî lê derkevin’

**Diyala Nîdal\ Qamişlo**

**Endamê Hunergeha Welat Xoşman Qado diyar kir ku wan pênc stran ji bo piştgirtiya QSD`ê li Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaxê pêşkêş kirin û wiha got: “Em hunermedên civakê ne û pêwîst e em xwedî Lı civaka xwe derkevin.”**

Hemû gelên herêmê piştgirtiya QSD`ê weke erkekî girtin li ser milê xwe û Hunergeha Welat jî, ji bo piştgirtiya QSD`ê li Bendava Tişrînê û Pira Qerqozaxê pênc stran pêşkêş kirine, ew jî ev in: ‘QSDê Hêviya Gelan e (Koma Tirbespiyê), Em QSD’ê Ne (Koma Zîlan), QSD’ê Heqîqet e (Danîş Botan), Gujj e Çemê Me û Bendava Me Ye’.

Du stran bi temamî li Hunergehê hatine çêkirine, ji gotin û mûzîk û aranje û hemû xebatên tomarkirinê; her du stran jî ev in:

Di derbarê kar û xebatên Hunergeha Welat yên di çarçoveya piştgirtiya QSD`ê de, endamê Hunergeha Welat Xoşman Qado ji Rojnameya me re axivî.

**‘Armanca me xurtkirina moralê gel e’**

Xoşman Qado anî ziman ku ev serê sê mehan e ku şervanên QDS`ê li Bendavê Tiştrînê û Pira Qereqozaqê berxwedaniyeke bêhempa didin meşandin û wiha got: “Erkê me jî weke hunermend ku em kar bikin, stranekê diyarî berxwedan û têkoşîna şervanên xwe QSD`ê bikin. Herwiha şervan û hevalên me yên ku li çeper û enîyên şer, li pira Qereqozaqê, Bendava Tişrînê li ber xwe didin û roja ne derbeyê giran li dagirkeriyê dixin, em jî weke hunermedên civakê xwest ku ji bo berxwedana QSD`ê li Bendava Tişrînê û Pira Qerqozaxê van her pênc stranin pêşkêş bikin. Herwiha armanca me ji pêşkêşkirina van stranan di vê demê de ew e ku xurtkirina moralê gel, pêştgiriya şervanan û dengvedana berxwedana BendavaTişrînê bendava Şehîdan e.”

**‘Pêwîste em li huner û çanda xwe xwedî derkevin’**

Endamê Hunergeha Welat Xoşman Qado da zanîn ku gelek piroje di plansazîya hunergehê de hene û dest bi amadekirin û karên van projeyan bûye û wiha bi dawî kir: “Ev karê me wê li gelek bajar û navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê were kirin û di demeke nêz de jî dê berhemên van pirojeyan bêne belavkirin. Herwiha huner avakirina hişmendîyeke afirîner karekî komî ye, lewre berpirsyarîya wê jî di vê demê de di asteke hişmend û têgihaştî de be. Huner hêmanê herî nazik û bi bandora şoreşê ye, ji ber vê yekê pêwîst e em li huner û çanda xwe xwedî derkevin.”



# ‘Nabe kesê sûcdar cihê xwe di siberoja Sûriyê de bigire’

Di zindanên Ebû Hatim El-Şeqra yê ku niha cihê xwe di nava deshiladariya nû ya Şamê de digire, du ciwanên ji bajarê Qamişlo girtî ne û ev şeş sal in çarenûsa wan ne diyar e.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Roja 12`ê Cotmeha 2019 çeteyên Ehrar Alşerqiyê bi serweriya Ebû Hatim El-Şeqra yên girêdayî dewleta Tirk ya dagîrker, rêbenda Tirwaziyê ya rêya M4 kontrol kiribû. Di encama kontrolkirina wan de gelek kesên sivîl yên ku di wê riyê re derbas dibûn, bê sûc didan girtin û şehîd xistin. Ji kesê ku di nav destê çeteyên Ehrar Alşerqiyê de ne, Azad Osman ku bavê sê zaroka ne û Mihemed Ela Îbrahîm ku kurê malbatê yê bi tenê ye.

Li gorî malbatên girtiyan zarokên wan di girtîgeha Silok ya li bajarê Girê Spî yê dagirkeriyî de ne, her ku malbat hewil didin hevdîtinê bi zarokê xwe re pêk bînin an jî bi telefonê bi wan re bi axivin çeteyên Ehrar El-Şerqiyê derfetê nadin.

Ji bo agahiyên zêdetir, malbatên herdû girtiyan ji rojnameya me re axivîn û daxwaz li aliyê têkildarê girtiya kirin ku, di mijara azadkirina zarokên wan de, bibin alîkar. Dayîka Mihemed Ela yê girtî Sena Hesen Ewad dibêje ku ji girtina kurê wê ve û heta roja îro, ti agahiyê ser nizane û ew diyar dike ku ev ev sûceke mezin e.

**`Şeş sal in bêsûc di zindanê de û agahî nayê’**

Sena Hesen Ewad diyar kir û ji dîroka girtina kurê wê yê bi tenê û heta vê demê ew ti agahiyan ser nizan e. Ev yek jî di derheqê kezebên dayîkan de sûceke mezin e. Sena Ewad wiha got; ``Ev şeş salin min ne deng ne jî agahiyek ji kurê xwe bihîstiye, ev neheqî û sûceke mezin e. Ji dema kurê min hatî giritin ji bilî carekî min ew nedîtiye wê care jî nikarî tiştekî biaxive. Min gelek caran hewil daye ku xwe bigihînim Mihemed û heyvekê jî li Girê Spî mam, lê çeteyan derfet neda.``

Sena Ewad got; kurê min Mihemed Ela û hevalên xwe sivîlin, ti sûc nekirine heta ku çeteyên Ehrar Alşerqiyê bi serweriya Ebû Hatim El-Şeqra, wan şeş salan bê agahî di


Sena Hesen


Sena Hesen

zindanê xwe de girtî bihêlin. Sena Hesen Ewad bang li rêveberiya Şamê ya nû Ehmed El-Şeri kir ku di mijara azadkirina kurê wê de bibe alîkar û wiha axaftina xwe bidawî kir: ``Banga min ya pêşî li Ehmed El-Şeri re heye ku çareseriyekê ji bo azadkirina zarokên me re di demeke kurt de, bibîne. Lewra yê ku kurê min girtiye li kêlek wî kar dike û cihê xwe di nava rêveberê digire.``

**`Divê çarenûsa zarokên me diyar bibe`**


Bavê Azad yê girtî Ebdelkerîm Reşîd Osman jî behsa girtina kurê xwe kir û bang li tevayîya rêxistinên mirovî dike da ku rê li ber kiryarên çeteyan bigirin û wiha got: ``Kurê min Azad ku bavê sê zaroka ye û yek jê hîn ew nedîtiyê, bê sûc di zindanên Ebû Hatim El-Şeqra de, şeş salin bê deng û agahîye. Komên çete yên girêdayî dewleta Tirk ya dagîrker, ne mafê mirova ne jî zagonên nevdewletî dizanin. Lewra yê girtî jî mafê axaftin û hevdîtina bi malbatên re heye.``

Li gorî malbatên girtiyan Azad û Mihemed Ela li ser otompêla gerandina dermanan kar dikirin. Ebdelkerîm Osman wiha axaftina xwe dewam kir: ``Kurê min Azad û hevalên xwe bê sûc hatine girtin, ew sivîl bûn û li ser karê xwe bûn. Bi çi mafî ev komên çete zarokên me wenda dikin. Divê di zûtirîn dem de, çarênûsa kurê min û hevalên wî diyar bibe.``

Bavê Azad yê girtî Ebdelkerîm Reşîd Osman di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser bicihkirina Ebû Hatim El-Şeqra di nava rêveberiya nû ya Şamê de û wiha got; ``Li ser çi bingehê rêveberiya nû ya Şamê sûcdareke mîna Ebû Hatim El-Şeqra cihê wî di nava rêveberiya nû çêdike. Em vê yekê qebûl nekin. Ji bo vê yekê em bang li tevayîya rêxistinên parastina mafê mirova dikin ku, ji bo azadiya zarokên me bi me re bibin alîkar. Divê em agahiyan li ser kurê xwe bi dest bixin eger ew şehîd jî xistibin bila bêjin û termê kurê me bidin destê me. Şeş sal ne demeke kurt e. Em li hêviya vegera zarokên xwe ne.``



## Xwenasîn



### Civaka ku jin têde ne azad e!

Rohat Bulut

Tiştek ji azadiyê xweştir nîne. Di her wateyê de bi her awayî azadî jiyanî ye. Jiyan dema ku ne azad be mirov nikare behsa xwezaya jiyanê bike. Lewre di xwezaya jiyanê de azadî heye. Jiyana ku em behs dikin ne ya ku tenê ji mirovan pêk tê. Jiyana bi giştî ya xwezayê û ya xwezayî. Di xwezayê de tenê di civaka mirovan de serdestî û bindestî heye. Ji derveyî mirovan hema bêje di navbera hemû zindîwaran de wekhevî heye. Her cureyên zindîwaran bi erk û berpirsyariya xwe ya di xwezayê de radibin. Lê mirov hem di nav xwezayê de hem jî di navbera xwe de vê erk û berpirsyariya xwe bi cîh naynin.

Mirovên di warê hişmendî de bi fen û fûtan serdestiyê dikin. Mirovên di warê fîzîkî de hêzdar serdestiyê li yên qels û lewaz dikin. Lê belê hemû zilamên xwedî hişmendiya baviksalarî, feodal û desthilat serdestiyê li jinê dikin. Ev serdestiya zilam ya li dijî jinê dijberî qanûna xwezayê ye. Heke hişmendiyeke li ser desthilatiyê be ne pêkane ku ji wê hişmendiyê azadiyek biafire. Bi taybetî jî di civakên ku têkoşîna azadiyê didin de. Beriya her tiştî pêwîstî bi rakirina nakokiyan heye. Mirov û civakên ku têkoşînên azadiyê didin heke bi xwe re têkevin nav nakokî û paradoksan ne pêkan e ku bigihêjin armanca xwe ya azadiyê. Lewma jî divê ev nakokî ji holê rabin.

Ji bo ji holê rakirina cihêkariya zayendî û afirandina şert û mercên zayendiya civakî pêwistî bi guherîna hişmendiya serdest a “baviksalarî” heye. Heta ev hişmendî neyê guherîn zehmete ku civak azad bibe. Bi taybetî jî wekî civaka Kurd û em têkoşîna azdiyê didin pêwîste em di nav xwe de jî azad bin. Ne tenê li dijî zext û tundiya ji hêz û dewletên serdest. Tenê di gotinê de nabe ku mirov bêje em azadî û wekheviyê diparêzin. A girîng ew e ku di her şert û mercî de di navbera jin û mêr de wekheviyek hebe û ew jiyan bi azadiyê tacîdar be.

Mirovên azadîxwaz, yên bi giyanî û bedenî qewîn encax dikare li ser bingeha azadiya zayendî vê cihêkariyê ji holê rabike. Em berê xwe bidinê li cihê ku azadî û wekhevî hebe li wê derê aramî û dilgeşî heye. Ji bo wê jî pêwistiya me ya sereke bi wekhevî û azadiyê heye. Wekheviya ku em behs dikin bi taybetî jî ya di navbera jin û zilam de ye. Di civakê de zilamê hêzdar her tim dixwaze jin bindest be ku bi hêsanî dikaribe xwe bide jiyîn. Heyîna li ser xistina jinê ava dike û di heman demê de xwe ji jiyana jinê jî berpirs dibîne ku dest werdide.

Têkoşîna ji bo azadiya civakê ya aştî, azadî, wekhevî û demokrasiyê heke ne li ser bingeha azadiya jinê be dê pêşeroja civakê jî ne azad be. Lewra jiyan bi jinê dest pê dike. Lewma jî ew civaka ku jin têde ne azad be ew civak bi xwe jî azad nabe. Ji ber vê yekê em bi hêsanî dikarin bêjin azadiya civakê di azadiya jinê re derbas dibe. Di civakê de heke ev hêman nebe ne pêkan e ku mirov behsa jiyaneke azad jî bike. Ji ber vê em dikarin bi hêsanî bêjin ku jin jiyan e, jiyan azad û wekhev bi xwe re civakeke demokratîk diafirîn e. Civaka ku jin têde ne azad be ew civak jî ne azad e û nikare têkoşîna azadiyê jî bide meşandin. Em tenê behsa azadiya fizîkî nakin. Li vir em behsa azadiya hişmendî, azadiya, giyanî, azadiya jiyanî, azadiya nirxî, azadiya çandî û civakî dikin. Ji lewre jî azadiya civakê di azadiya jinê re derbas dibe.

# ‘Pêwîst e welatî jî di paqijiya bajêr de bi me re alîkar bin’

**Navenda Nûçeyan**

**Rêveberê Ofîsa Beşa Paqijiyê ya Şarerdariya bajarê Qamişlo Mihdî Eqîl diyar kir ku ew li gorî derfetên xwe rojane taxên bajêr paqij dikin û got, “Ev heftiyeke ku karê me di asteke herî baş de tên meşandin û me pirojeyên xwe yên dema pêş hildana û li hêviya erêkirinê ne.”**

Şaredariya Gela a bajarê Qamişlo, tevî êrîşên heyî yên ser herêmê û rewşa zehmet ya aborî jî, kar û xebatên rêvebirin û pêşkêşkirina xizmetguzariyên civakê yên wek; ekolojî, paqijî, sîstema riyên bajar û gundewarên wê di asteke baş de dide meşandin. Herwiha Şaredariyê roj bi roj kar û xebatên xwe berfirehtir kir û didomîn e.



Di derbarê piroje, kar û xebatên beşa paqijiyê a Şaredariya bajarê Qamişlo Rêveberê Ofîsa Beşa Paqijiyê a Şaredariya bajarê Qamişlo Mihdî Eqîl ji Rojnameya me re axivî.

**Kar û xebat**

Mihdî Eqîl anî ziman ku kar û xebatên beşên paqijiyê di asteke baş de tên meşandin û wiha got: “Karê paqijiyê karekî rojane ye û rojane di seat 6`an de karkerên me derdikevin kolanan û paqijeya kolanan dikin. Herwiha em paqijiya saziyên xwe jî dikin û erebeyên me li nava taxan yên paqijiyê hefiyê 3`ê caran derdikevin. Di heman demê de erebeyên me yên li nava riya bajaran rojê 3`ê caran diçin û tên û karê me bi vê awayî tê meşandin û berdewame. Hejmara karkerên ku karê paqijiyê dikin 150`î ne, ev heftiyeke ku karê me di asteke herî baş de tên birêvebirin.”

**Piroje û astengiyên beşa paqijiya a şaredariya bajarê Qamişlo**

Mihdî Eqîl da zanîn ku wan kargeheke bi navê ji hevcûdakirina çopê li taxa Elaya a bajarê Qamişlo çêkir û wiha domanid: “Ev şeş meh in ku karker di kargehê de kar dikin û ew amedeye lê li benda amûran in. Herwiha me pirojeyên xwe yên dema pêş hildane li hêviya erêkirinê ne. Di heman demê de pirsgirêkên ku em di karê xwe de dibînin,ew jî şûnmayên kargihanin di bajar de û hem jî erebeyên me yên paqijiyê kevin bûn, nema dikarin kar bikin . Ji ber vê yekê pirsgirêk di karê me de derdikevin, lê em hewldidin ku ev pirsgirêk nemînin û bên çareserkirin.”

Rêveberê Ofîsa beşê paqijiyê a şaredariya bajarê Qamişlo Mihdî Eqîl axftina xwe wiha bi dawî kir: “Pêwîste gel bi me re alîkarbin û bangewaziyam min ji gelê me re heye ku dema erebeya paqijiyê hat li gorî wê demê qirêja xwe derxin.”



# ‘Eger merc pêk werin wê êrişên li ser Rojava rawestin’

Ferzende Munzur diyar kir ku hetanî PKK’ê çekan deyne, divê merc bên pêkanîn, ew jî ew e ku Rêber Apo pêşengtiya qonaxa çekdanîn û aştiyê bike. Herwiha Munzur da zanîn ku eger mercên aştiyê pêk werin wê êrişên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bi dawî bibin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Piştî civîna heyeta DEM Partî a ku bi Rêberê Gelan Abdullah Ocalan re di 27’ê Sibatê de, kir, banga Rêber Apo bi riya daxuyaniyekê veguhest ji cemawerên cîhanî yên Rêber Apo re.

Bang ji bo destpêkirina pêvajoya aştiyê û demokrasiya gelan bû, bi taybet gelê kurd û tirk, di banga Rêber Apo de doza rawestandina şer û destpêkirina dualî ya aştiyê ji dewleta Tirk û PKK’ê hat kirin. Derbarê banga Rêber Apo de berdevkê Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê Ferzende Munzur ji rojnameya me re axivî.

**‘Nameya Rêber Apo watedar û dîrokî bû’**

Munzur da zanîn ku banga Rêber Apo bangeke dîrokî bû ji wê bangê gelek nirxandin tên kirin û wiha got: “Name û banga Rêber Apo, nameyeke dîrokî, pir bicesarte û wêrekî ye, her kes vê yekê jî wiha dinirxîne. Di vê nameyê de gelek rastî tên eşkerekirin, belgeyên dîrokî girêdayî têkoşînê hene ku çima PKK’ê rahiştiye çekan, PKK’ê di çi mercan de hatiye damezirandin û niha di çi rewşê de ye. Lewma jî da ku çareserî pêk were, eger dewleta



Tirk şert û mercan pêk bîne, siyaseta demokratîk û hiqûqî ji bo gelê kurd di vê mijarê de bide meşandin, çi bikeve ser milê Tevgera Azadiyê û hemû rêxistinên kurdan wê pêk bînin. Bê guman divê mafê kurdan di destûran de were parastin û gelê kurd di warê siyasî de xwe bi rê ve bibin. Nameya Rêber Apo pir watedar bû, mirov dikare derheqê her peyvek ji peyvên û her hevokek ji hevokên wî şîroveyên berfireh bike. Ev name dikare guhertineke mezin li ser asta Rojhilata Navîn û cîhanê tevî çêbike.”

**‘Mercên çekdanînê hene, ne hema bi daxuyaniyekê pêk tê’**

Ferzende Munzur diyar kir ku hetanî ku PKK’ê çekan deyne, divê merc bên pêkanîn, ew jî ew e ku Rêber Apo pêşengtiya qonaxa çekdanîn û aştiyê bike û wiha domand: “Di destpêka vê nameyê de Rêbertî li ser têkiliyên di navbera gelê kurd



û tirk ên dîrokî dike, di çarçoveya hezar salî de van her du gelan di erdîngariya Kurdisatn û Enedolê de bi hev re jiyane. Gelê kurd û tirk li kêleka hev, li hemberî êrişan, li gorî xweseriya her civakekê parastina herêmên xwe kirine. Wekî em dizanin mêrinşîn û impiratoriyên kurdan hebûn, bi dirêjahiya dîrokê kurd rastî şerê çandî, civakî û ziman nehatine, lê ji 200 salî û bi şûn ve heta roja îro di warê ziman, çand û hemû mafên xwe tên înkarkirin. Li hemberî vê inkarê jî Rêber Apo PKK’ê damezrandin û Tevgera Azadiyê rahişt çekan. Ji bo çareserkirina pirsgirêka inkarkirinê, li hemberî wê jî destpêkirina pêvajoya aştiyê, Rêber Apo baş şîrove dike. Danîna çekan ne hema bi daxuyaniyekê ye, divê şertên pêvajoyê û aştiyê bi cih werin. PKK’ê dibêje em şerê çekdarî nema dikin, eger ew êrişî me nekin em êriş nakin, lê divê Rêber Apo bi hevalên xwe re bide û bistîne. Hem jî pêşengtiyê di warê meşandina pêvajoya aştiyê û lidarxistina kongreya fesxkirinê bike, ji ber ku tenê Rêbertî dikare pêvajoya aştiyê û çekdanînê bimeşîne.”

**‘Eger merc pêk werin wê êrişên li ser Rojava rawestin’**

Berdevkê Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê Ferzende Munzur destnîşan kir ku eger mercên aştiyê pêk werin wê êrişên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dawî bibin û wisa bi lêv kir: “Aliyê ku siyaseta inkarkirinê di derheqê gelê kurd de dike û dixwaze destkeftiyên kurdan têk bibe dewleta Tirk e. Eger dewleta Tirk vê siyaseta xwe biguherîne û banga Rêber Apo ya aştiyê pêk were, wê rewşeke erênî li her çar parçeyên Kurdistanê rûbide. Di serî de li Bakurê Kurdistanê, hem jî li Rojava û Başûrê Kurdistanê wê rewş bê guhertin, bê guman wê. Herwiha wê Rojava û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî qezencê ji vê pêvajoyê werbigire. Wê ev êrişên qirkirinê yên rojane ku li ser gelên me pêk tên û di encamê de zarok, jin, kalemêr û leşker şehîd dikevin, bên rawestandin. Di heman demê de wê êrişên li ser Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê bisekinin. Li aliyekî din wê zexta dewleta Tirk a ku li ser rêveberiya Şamê dida meşandin ji bo gelê kurd cihê xwe di siberoja Sûriyê de negirin, bê bi dawî bibe. Êdî rewşa Sûriyê li gorî perpektîf û nirxandinên Rêber Apo wê bi rê ve biçe. Wê rêbeberiyeke demokrat û hevbeş ava bibe, hem jî ev destkeftî wê bibe ya hemû gelên Sûriyê. Di encamê de wê hemû şer, êş û xwîn bidawî bibin, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî wê qonaxa pêşxistina hilbijartin û sazîbûyînê dest pê bike.”

# Pêşeroja Sûriyê û riyên çareseriyê

**Elî Roj**

Li Sûriyê ji 27’ê Mijdarê heya îro guhertinên tên jiyîn, pêvajoyekî demkî ye. Di vê pêvajoya demkî de ne rêveberiya HTŞ’ê, ne hêzên îro dixwazin HTŞ’ê rewa bikin, heya niha nikarin vê yekê pêk bînin. Di nêzikbûnên Tirkiyê de ku Sûriyê weke wîlateyeke xwe dibîne û dixwaze destwerdaneke wisa li ser Sûriyê bike, heya niha serkeftî nebûye. Di rastiyê de sedemeke sereke ku bê îstîkrarî hê jî li Sûriyê didome, ev nêzîkbûnên Tirkiyê ne. Ev yek bandora xwe li tevahî herêmê jî dike.

Piştî hilweşîna rejîma Baas, pêşketinên çêdibin ne tenê bi Sûriye ve girêdayî ne. Di çarçoveya planeke li ser Rojhilata Navîn de pêş dikevin, dema ku em Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê digrin dest, ev yek ji rewşa giştî ya Rojhilata Navîn ne qut e. Ev yek jî nîşan dide ku ji her demekê zêdetir çareseriya Rojhilata Navîn û Sûriyê nîqaşkirin pêwîst dike. Bi taybetî Sûriyeyeke demokratîk û nenavendî wê bi xwe re hemû pirsgirêkên heyî heyanî astekî çareser bike. Heya niha tiştê ku bi HTŞ’ê dixwazin bikin, aloziya heyî kûrtir û berfirehtir dike û ev yek Sûriyê berû qeyran û alûziyê ve dibe. Ji milekî din ve jî di nûnertiya Rêveberiya Xweser de pergala demokratîk û ne navendî dikare derkeve pêş. Bi taybetî li ser bingehê azadî û parastina mafê jinan û hemû pêkhate û rengîniya herêmê dikare were destgirtin. Ango tenê danasîna aloziyê têrê nake, zimanê wê yê çareseriyê jî divê were pêş xistin. Weke diyar dibe dixwazin HTŞ’ê rewa bikin û pergaleke wiha li Şamê bidin rûniştandin û ev serdanên jê re çêdibin jî, weke destpêkirina rewakirina wê ye. Lê hemû îşaret û dane destnîşan dikin ku wê ev tiştê ku dixwazin rewa bikin li serê Sûriyê û giştî herêmê pirsgirekeke nû pêş bixe. Di vê pêvajoyê de nêzikbûn û sekna Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, wê bandora xwe li seranserî Sûriyê bike û wê bi xwere jî li ser erdê guhertinan pêkbîne. Jixwe êdî her kes pîvan û alternatîfa vê pergalê nas dike. Lê bi taybetî di vê pêvajoyê de fikir, pîvan û pergala rêveberiya xweser pêwîste ku baştir were vegotin û her kes bi rengekî baştir nasbike. Herwiha divê weke alternatîfa sereke û yekane were destgirtin. Li milekî din jî êrişên dagirkeriya tirk û çeteyên wê, bê navber didomin û bi taybet jî li ser bendava Tişrîn, pira Qereaozaqê, Kobanê û seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomin. Li hemberî van êrişan jî berxwedana bêhempa ya gel ji heft salî heyanî heftî salî jî berdewame. Gelê rojane şehîd û birîndaran dide, lê ji bona parastina xaka xwe gav paşde navêje û soza berxwedan û têkoşînê daye. Berxwedana ku îro li bendava şehîdan tê meşandin di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de tê meşandin. Lewma divê weke parçeyekî girîng yê şerê gelê şoreşgerî were destgirtin. Herwiha li Rojhilata Navîn û bi taybet jî Suriye rojev her ku diçe gerimtir dibin. Geşedanên bi lez ên ku siyaseta hemû hêzan araste dikin, li pey hev çêdibin.

Hevdîtina şandeya DEM’ê bi Rêber Apo re û piştî wê hevdîtinên ji bona çareseriyê yên ku bi partiyên siyasî, kesayet û li başurê Kurdistanê jî hevdîtinên ku bi partiyên siyasî û kesayetên siyasetmedar re çêbûn; bi xwere liv û tevger û guftûguhên berfireh ji bona çareseriya pirsgirêka Kurd û alûziyên ku di rojhilata navîn de têne jiyan kirin raxiste ber çavan û riyên çareseriya wê jî danîne holê.

# Remzî Kartal: Encama pêvajoyê nexşerêya gelên azadîxwaz e

Hevserokê Kongra Gel Remzî Kartal diyar kir ku hevdîtînên li gel Rêber Abdullah Ocalan pêk tên, encama têkoşîna gelan e û wiha got: "Ji bo ev têkoşîn bighê encamê pêwîst e em xwe bighînin hemû aliyan û nexşerêya Rêber Apo baş fêm bikin."

**Argêş Vîyan /Qamişlo**

Di derbarê hevdîtînên li gel Rêber Abdullah Ocalan ku pêk tên, naveroka peyama Rêber Apo ya ji bona Ewropa şandî de, hevserokê KONGRA-GEL Remzî Kartal pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

**-Hûn vê pêvajoya ku bi pêşengtiya Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan dimeşe û hevdîtînên bi desteya Dem Partiyê re tên kirin, çawa dinirxînin?**

Ev pêvajoya hevdîtinan ya li gel Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan re dimeşe, Şerê Cîhanê yê 3'emîn ya ku navenda wê Rojhilata Navîne encama wê ye. Bi taybet jî, piştî şoreşa Rojavayê Kurdistanê ji bona deskeftiyên gelê Kurd têk bibe, derfetên di destê xwe de yê herî pêşketî bikar anî. Dewleta Tirk pergala xwe giştî bi li gorî têkbirina Tevgera Azadiyê deskeftiyên kurdan xwe birêxistin kir. Ev proseya ku difikirin serneket û ji bona wê jî di hindirê Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê de qeyranên aborî û siyasî rû da. Pêşketinên ku Rojhilata Navîn û cîhanê di qewimîn weke Şerê Israîl û Hemasê, Rusya û Ukranyayê metirsiyekê mezin ya têkçûyinê di hikûmeta AKP-MHP'ê de da avakirin. Ji bona ji nûve dizaynkirina Rojhilata Navîn plansaziyên DYA û Israîlê jî, ji bona Israîl bibe hêzekê hegemon ya cihanê jî di aliyekê de rola xwe leyist. Her hêza ku li Rojhilata Navîn de cih digirt, hewildan dikir ku li gorî xwe herêmê dizayn bikin.



Ev paradigmaya Rêber Apo ya ku azadiya gelan bingeh digire ji bona gelên ku bindestin hêvîyekê mezin da avakirin. Hat xuyakirin ku çareseriya alozî û gengeşeyên li Rojhilata Navîn bi ramanên Rêber Apo pêkan e. Ji bona çareserî û aşitî bê herêmê Rêber Apo hewildanên pir girîng û mezin kirin. Ev hêza ku Rêber Apo dabû nîşandan rayedarên dewleta Tirk ya dagirker neçar hişt ku biçin hevdîtinan li Imralî destpê bikin. Ev zemîna ku avabûye Rêber Apo jî dê wê ji bona berjewendiyên gelan bikartîne. Desthilatiya AKP-MHP'ê tirsekê mezin jiyan dikin û ji ber wê tirsa wan ya têkçuyinê bingeh avakirin ku hevdîtîn li gel Rêber Apo dan destpêkirin. Ev pêvajoya bi pêşengtiya Rêber Apo de, derfetên têkoşînê vebe, pengavekî dîrokî ye. Di wê çarçoveyê da desteya ku parlementerên Dem Partiyê de bi pêk tên çend rêze hevdîtîn li gel Rêberê Gelan kirin. Li gor wan hevdîtinên di navbera desteya Dem Partî û rayedarên dewletê de dê rolekê bileyizin û derfet ji bona Rêber Apo bên avakirin jî dê ne tenê li Kurdistanê giştî Rojhilata Navîn bikeve di nav pêvajoyekê nû û aşitiyê. Di heman demê de jî nêrînên Rêber Apo hemû derdorên ku peywendidar re bên parve kirin.

**-Weke we jî anî li ser ziman Rêber Apo name û peyamên xwe ji bona beşên cuda yê Tevgera Azadiyê şand. Di derheqê ev peyama ji bona kurdên Ewropa hatibû şandin hûn dikarin hin agahyan bi me re parve bikin?**

Rêber Apo di derheqê pirsgrêka Kurd ya ketiye qonaxekî nû de bi her kesî re nêrînên xwe parve kir. Rêber Apo çawa ku partiyên ku li Tirkiyê de sîyaseta legal dimeşînîn di encamê hevdîtinan û plansaziyên xwe yên demên pêş parve kir û aliyên demoqrat daxwaz kir ku piştgrî bidin pêvajoya nû ya aşitî û demoqrasiyê. Dîsa di heman demê de jî, hemû partî û rêxistinên Kurdistanê dixwaze ev demên dîrokî de erka ku dikeve li ser milên wan pêkbînin. Bangewaziya Rêber Apo ji bona Tevgera Azadiyê jî ew e ku li her beşên ku cîhanê yên qadên şoreşê xebatê xwe xurt bikin. Rêber Apo bi desteya Dem Partiyê re çend peyam şandin yêk ji ji bona beşa derveyî welat ji bona tevger û civaka Ewropa şand. Rêber Apo dibêjê "Kurdên diaspora û Ewropa jiyan dikin, rêxistina xwe heya astekê dane avakirin û şoreşa Kurdistanî hemû enternasyonal û dostên kurdan daye naskirin. Lê ev ne têrker e, pêwîste em xwe bigihînin hemû aliyan û ji ber ku ev pêvajoya gelan e û divê cîhan hemû sûd jê werbigire." di hemû aliyan dixwaze guhertinekî bingehîn bidin avakirin û ji aliyên peywendîdar jî daxwaz dike ku pêwîste ev şert û mercên guhertinê re jêrzemînekê xurt bidin avakirin." Rêber Apo tîne li ser ziman ku pêvajoya ku tê jiyan kirin kêliyên serkeftinê ne, pêwîste baş bikar bînin û divê ciddî nêzikatiyek bidin xuyakirin ji bona pêşveçûyina pêvajoyê. Rêber Apo nêrîn û perspektîfên xwe ji bona Tevgera Azadiyê tîne li ser ziman û silavên xwe yên gerim ji bona gelê welatparêz û derdorên azadîxwaz yên Ewropa û diaspora de jiyan dikin re dîşîne. Li wir de jî, rola sereke dikeve li ser milê gelê me yê azadîxwaz.

**- Ev pêvajoya ku bi pêşengiya Rêber Apo de destpê kir, ji bona bigihije encamekê bingehîn erka ku dikeve li ser her du aliyan weke Tevgera Azadiya Kurdistanê û hikûmet û rayedarên dewleta Tirk çiye?**

Ev pêvajoya ji bona her du aliyan jî pevajoyekê pir taybet û hesas e. Ev dê bibe encama têkoşîna berxwedaniya gelan ya salan ya ku pir zehmetî kişandin e. Rêber Apo li ser armancakê mezin xwe ji bona wan rojên azad amade kir, nexşerêyekî ji bona encama bigire dan pêşiya xwe. Dê bi wê pêvajoya têkoşîna gelan de, hîmên azadiya Rêber Apo hatin avêtin. Hêzên ku hemû nasname û baweriyên civakî di nav xwe de dihewînin, erka mezin dikeve li ser milê wan jî. Pêwîste li ser bingeha paradigmaya Rêber Apo ya Netewa Demokratîk de, hevgirtina gelan çêbikin, nêrîn û perspektifên Rêber Apo di her du aliyan de baş bê fêmkirin û pêkanîn. Taybet ji bona hevgartina pêkhateyên ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jiyan dikin pir girîng û pewîst e û divê hêztir û xurttir bib ê. Ev erka mezin jî dikeve li ser mile Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Ji ber ku gelek kesên hewildidin aramiya kurdan û hevgirtina gelan xêrab bikin û ev pêvajoya Neteweya Demokratîk ya gelan sernekeve hene. Ev plansaziyên dewleta Tirk ya ji bona astengkirin û zêde cidî nêz nebûna pêvajoyê bi hevgirtina gelan têk bibin û pêvajoya nû jî em bigihînin serkeftin û ji bona bibe pergala berjenwendiyên gelan û civakên bindest.

**-Peyama we derdorên ku xwe dûr li wê pêvajoyê digirin çîy e?**

Ev peyam û pêvajoya pêşengtiya Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan de yekser li ser rojeva Rojhilata Navîn û cîhanî bandor bike. Gelên û hêzên demokrasi xwez divê xwe berpisryar bibînin û ev pêvajo ne tene pêvajoya gelê Kurde, di heman demê de pêvajoyekî cîhanî ye. Edî hewcedariya herêmê û gelê Kurd aramî û aşitîyê heye û demê wê jî derbas bûye. Ev pêngava Rêber Apo ya çareseriya pirsgirêka kurd bê mezinkirin û hemû derdoran re bidin fêmkirin, ji ber her alî tevlî wê pêvajoyê bibin. Ji ber wê yekê bingeha çareseriya pirsgrêkên herêm û cîhanî azadiya Rêber Apo û çareseriya pirsgrêkên gelan e. Em jî weke Tevgera Azadî û gelên Ewropa û dîaspora de jiyan dikin sala 2025'an em ê bikin sala azadiya Rêber û çareseriya pirsgrêka gelan û silavên Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan bi keyfxweşî pêşwazî dikin û silavên xwe yên germ ji bona girava Imraliyê Rêber Apo re dişinin.

# 'Girêka Gordion' û çareseriya Rêber Apo

**Reşo Meydana**

Em ê zêde dirêj nekin hema kurt lê bidin: li gorî mîtolojiya Yewnaniyan ewliya û fîlozofekî demê, arebokekê bi girêkekê li mabedek Atînayê girêdide û dibêje, "kî vê girêkê jê veke ew ê hemû cîhan û Asyayê vegire". Ji meczûp, ewliya û derwêşên Atînayê bigire, her kesê bi xwe bawer û ne bawer tê xwe li vê girêkê dide lê... mixabin nikare bi ser bikeve.

Dawiya dawî, Îskenderê mezin ê kurê Filip tê xwe li vê girêkê diqelibîne. Lê pê nikare! Ecz dibe, ji ruhê xwe derdikeve! Çawa dibe ku ew Îskenderê bibe nîv-xweda nikare girêkek ji rêzê jê veke? Ji nişka ve şûrê xwe ji kalana wê dikişîne û lê dide. Girêka me bi milekî ve dibe û areboka pêve girêdayî paşpaşikî digindore, diçe binê dolê.

Armanca me, ne ew e ku em pesna Îskenderê mezin bidin. Berûvajî...

Welatparêz, dost û heta kesên ku tevlî fikrên Rêber Apo nabin lê dîsa jî Paraznameyên wî xwendine dizanin ku Abdullah Ocalan hem wekî kes û hem jî Tevgera Azadiyê, wekî tevgereke dijî Îskender tarîf dike. Dijî Îskender tê çi maneyê? Yanî pirsgirêkên heyî, bi hêza nerm (bi erênî), bi 'veguherîna demokratîk çareserkirine...' Vaye me ji ber vê yekê çîroka Îskender û girêka Gordion anî li ser ziman.

Di heman demê de di navbera Girêka Gordion û pirsgirêka Kurd de jî şibandineke nexêrê heye. Bi sed xweziya ne wisa bûye! Ya me Kurdan jî hema di çend salan de bi çend êş û azaran çareser bûya! Mînak, gelek şoreşên li cîhanê û ya herî dawî Kuba, bi çend sed gerîlayan dest pê kiriye û di çend salan de di astekê de pirsgirêka xwe çareser kirine. Lê pirsgirêka Kurdan ne wisa ji rêzê ye. Ev ne îdîayek e, em niha wekî dibêje zindî - zindî di nav de dijîn. Di destpêkê de (ya rast gerek di dawî de be) Kurd û welatê Kurdan ji aliyê çar hêzên dagirker ve hatiye dagirkirin. Ev hêz, dibêjin, em ê îlelebet li ser singa Kurdistanê konê xwe vedin". Ev bû çar girêkên li gewriya Kurdan hatine girêdan. Hêzên sereke yên Ewrûpa bi destê xwe ev pirsgirêk çêkirine û dane destê hêzên herêmî. Ev bû sed girêkên li patik, li ser sing û li ser çav û difna me hatine girêdan. Hêzên din ên cîhanî yên moderniteya sermayedar jî serbarê wê...

Ev hêz hemû, yekser yan jî ne yekser ji pirsgirêka Kurdan berpirsiyar in. Delîla vê çi ye?

Roja ku bangawaziya Rêber Apo hate bihîstin, ji Sînê (Çîn) bigire heta bi Îraqê hemû hêzan sekna xwe nîşandan. Rast e, sedema esasî ew bû ku Rêber Apo bi şûrê xwe yê antî-Îskenderî ku ji 'veguherîna demokratîk' pêk dihat li Pirsgirêka Kurd dabû! Çi ye ev şûrê (hemleya veguherîna demokratîk) di destê Rêber Apo de?

PKK, Tevgera Azadiyê ji ber neheqiyeke dîrokî, di şertûmercên sedsala 20. de dest bi meşa xwe ya dîrokî kir. Bi giranî ji vê sedsalê bi bandor bû. Ji ber vê yekê, bi şiklekî ecêb, her çiqas li pey heqîqata azadiyê bû jî, bi tecrîdeke mezin re rû bi rû ma! Hêzên ku di her astê de pirsgirêka Kurd afirandine û ji avabûna PKK'ê re zemîna dîrokî hazir kirine, bi rûreşiyeke mezin, PKK'ê 'terorîst' îlan kirin.

Rêber Apo çi kir? Di 25'ê Sibata 2025'an de li İmraliya ku teyrûtu lê nafirin, giya lê şîn nabe û temenê mirovan jê dixwe, civata xwe civand ji dinya-alemê re ragihand: Ji ber ku gotinên wî di ragihandina cîhanê de wekî bûyî pir tê nîqaşkirin, me jî ew guhdar kir. Me du tişt jê fêm kirin: destpêkê ji welatparêz, milîtanên tevgera azadiyê û gelan re dibêje 'hemleya guherîn û veguherîna demokratîk bi pêş bixin!'. ya duyemîn ji bo hêzên dewletî ye: 'Madem hûn dibêjin PKK'ê terorîst e, çekên wê pir xedar in', ez dibêjim bila xwe fesh bikin û çek daynin lê hûn ê jî, dest ji înkara Kurdan berdin. Eger hûn wisa bikin jixwe hewcedariya PKK'ê û çekên wê ji holê radibe.' Dibe ku kêm yan jî zêde be bi kurtî, me jê ew qas fêm kir.

Em vê yekê jî bêjin ku dost û dijmin, welatparêz û milîtanên Rêber Apo, kî dibe bila bibe, kesên ku fikrên wî neşopandine-naşopînin, Paraznameyên wî nexwendine-naxwînin ji vê pêngava Rêber Apo jî fêm nakin?

Em vegerin destpêka gotara xwe... dema ku Îskenderê zulqirneyn çavê wî li Girêka Gordion ketibû çi kiribû? Xwe li ber wê çêkiribû, pir pê re mijûl bibû. Dema pê nekarîbû, çareserî bi şûrê xwe yê şer afirandibû. Rêber Apo hewl dide, pirsgirêka Kurd ku ji Girêka Gordion hezar car kortir û girantir e bi terza xwe yê berûvajî yê Îskender û bi derba 'hemleya veguherîna demokratîk' çareser bike!

Xelata Îskender jê re bû dagirkirina cîhana wê serdemê; çareseriya Pirsgirêka Kurd bi rêbaz û banga Rêber Apo, wê gelên Rojhilata Navîn û cîhanê azad bike!



# "Ji ber ku bajarê me dagirkirî ye, barê me duqatî ye"

**Idrîs Henan**

Di demeke ku tevahiya gelê kurd li çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê li benda peyama Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan bûn, dewleta Tirk a dagirker dengekî dîtir ê rastî û heqîqetê soyqest dike û carek din hewl dide tirsa xwe ya ji dengê rastiyê bi êrişa bi ser rojnamevanan ve veşêre.

Dewleta Tirk a dagirker naxwaze civak agahiyên di derbarê têkçûna wê ya li bendava Tişrînê werbigire. Ji lew re êriş dike û hewl dide civakê ji agahiyên rast qut bike û rojnamevanên ku şahidên efsaneyên berxwedanê ne qetil dike. Lê dualîteya ragihandin, dîrok weke rêûresmeke herikbar ji mewziyeke dijwate bi heqîqeta mejûyî ya ragihandina azad re pêşeroja gelekî heyranê azadî û demokrasiyê ava dike.

**'Qehremaniya bêhempa'**

Rojnamevan Şehîd Egîd Roj di peyama xwe ya dawî de vê yekê weke qehremaniyek qet nehatiye dîtin pênase dike û dibêje: "Dengê bombeyan her tiştî li dora min wêran dike. Li ser xaka me ya pak a ku her dem çavkaniya hêz û hêviya me ye, ez ji we re li ser qehremaniya ku hêj di pirtûkan de nehatiye tomarkirin û li ser sekna ku tenê yên li vir dibînin, dinivîsim".

**Egîd Roj rêwiyê heqîqetê ye**

Şehîd Egîd Roj ku yek ji rêwiyên heqîqetê yên li bendava Tişrînê bû, bi nûçe û raportên ku li gorî stratejiya netewperwer xwe erkdar dike û bi misyona avakirina civaka azad erkên xwe bi cih dianîn. Egîd Roj vê israra xwe ya ragihandina heqîqetê dispêre ramanên Rêber APO û pakrewanên azadiyê ku di peyama xwe de tekezî lê dike û dibêje: "Em hêviya azadiyê, ji ramanên Rêber Abdullah Ocalan digirin. Em ji ramana wî fêr bûn ku azadî ne tenê dirûşme, di heman demê de enerjiyeke di hundirê me de ye. Baweriya min bi hêza cangoriyên azadiyê yên ku peyama Rêber Ocalan hildigirin û deriyên serkeftinê vedikin heye. Ev şervanên ku ruhê wan bi fikra azadî û wêrekiyê ve girêdayî ye, dê dîroka Kurdistanê û Efrînê binivîsin".

**'Teorî û pratîka xwe nûjen dikirin'**

Bê guman girîngtirîn rola xwe bi têkoşîna parastina hevgirtina civakî, bicihanîna edalet, wekhevî û demokrasiyê û bi pêşengiya têkoşîna ji bo rizgarkirina Efrînê rave dikir. Çendîn bîriyên xwe yên ji bo Efrînê vedigotin, lê ji bo azadkirina wê jî her di nava nûjenkirina rêbazên xwe yên yekirina teorî û pratîkê de bû. Egîd Roj ew yek dispart zindîkirina xeyalên pakrewanan û wiha vedigot: "Berxwedana Efrînê, çiyayên wê, Şehbayê, kampên wê û niha jî li Bendava Tişrînê bû wateya herî bilind a sebr û îradeya ku ez ê her kêlî, her lêdana dil û her awirên lehengên me yên ku ji bo zindîkirina xewna me têkoşiyan, bibîr bînim".

**'Ji aramancên xwe dûr nekevin!'**

Ji bo avakirina aqilê civakê û parastina hafîzeya giştî, ragihnadina azad weke şêweyê rasteqîn ê bi bandor û kûrahiyek stratejîk pênase dike û di oxira avakirina welatekî serbixwe û civakeke azad, buyerê jiyan dike, pê bandor dibe, pê re mezin dibe û têgihaştina xwe ya exlaq polîtîk ava dike. Bi wê fêmkirina kûr şahidiya xwe vediguhere hunerke cenga heqîqetê, ancax lêgerînerk rastiyê be ku wan hestên wî hîs bike. Bi vê baweriya xwe ya kûr ku xwe spartiye fikrên azad ji gelê xwe dixwaze li ber xwe bide û bi têkoşîna xwe bawer bike û digot: "Ji gelê me yê têkoşer re, ez hêvîdar im ku hûn ji armanca xwe dûr nekevin. 8 sal in ji bo em vegerin warên xwe em li ber xwe didin. Fedekariyek mezin hat



raberkirin, Efrîn, ax û zeytûnên wê yên gelê Efrînê ne. Divê ev berxwedan hê bêhtir xurt bibe".

Hêvî û xeyalên xwe yên vegera Efrînê jî bi van gotinan tekûz dikir: "Hê jî hêviyek di dilê kesên ku bi jiyan û azadiyê bawer dikin heye. Hêvî di dilê dê, bav, xwişk, heval û xizmên min de lêdide. Hûn ew qehremanên ku dê ala rizgariyê hildin. Hûn ê dawî li vê tarîtiyê bînin. Hûn ê Kurdistan û Efrînê ronî bikin û xeyala me ya veger û rûmetê pêk bînin".

**'Ragihandina azad civaka demokratîk e'**

Eger dîrok buyer û pêvekên wê be, ragihandina azad jî wê buyerê çêdike û amûreke zindîkirina civakê û vejandina wê ye. Bi gotinek din, ragihandin amûrê demokratîzekirina buyerê û dîroka demokrasiyê bi xwe ye. Kesê vê dualîteyê bi ser dixe rojnamevanên azad ên ku dîrokê bi pêvajoya têkoşîna xwe re diteyisînin. Lew re jî, ji Mûsa Enter, Mezlûm Dogan, Gurbetelî Ersoz, Qasim Engîn û Seyid Evrenan bigire û heya Nazim, Cîhan, Egîd û Ezîzan, têkoşîna wan hîmê bingeha civaka demokratîk û têgihaştina gel ji mafên xwe re ava kiriye. Bi rabûn û rûniştin, islûb û şêwazên xwe yê afrîner, karakterê ferdê azad tayîn dikirin. Ji ber vê xisletên han, ti carî dudilî jiyan nekirin û di oxira agahdarkirina civaka xwe û avakirina çarçoveya paradîgmaya Netewa Demokratîk de, canê xwe bê dudilî feda kirin û bûn firişteya ku xwe gihandiye heqîqetê.

**'Pêşengiya serkeftina têkoşîna gelê me, berpirsiyariya me ye'**

Egîd Roj û rêhevalên wî ti carî ragihandin tenê weke amûreke veguhestina buyer û nûçeyan negirtine dest, berovajî wê yekê, bi hêza xwe ya avakirina perensîb û nirxan; reftarên çewt sererst kirin û bûne eynika rasteqîn a êş, azr, doz û hêviyên civakê. Ji ber wê têgihaştina berpirsiyarên dîrokî, şahidiya efsaneyên dîrokî kirine û weke misyon û erkekî pîroz, peyamên dilsoziyê li pey xwe hiştine.

Egîd Roj her digot: "Hevalno…! Em xwedî erkekî dîrokî ne. Berpirsiyariya me ew e, ku em pêşengiya serkeftina têkoşîna gelê xwe ya azadî û demokrasiyê bikin. Ji bona wê jî em ê dilsozê xeta Rêber APO bin ku çi bikeve ser milê me, em ê bi cih bînin. Di vî warî de barê me rojnamevanên Efrînê jî duqatî ye, Ji ber ku bajarê me dagirkirî ye".

## Di pirsgirêka Kurd de çek ji holê tê rakirin



**Zekî Bedran**

Banga Rêber Apo ya dîrokî hem li hundir hem jî li derve hat pêşwazîkirin û rastî eleqeyek mezin hat. Di serî de NY, DYA û welatên Ewropayê jî gelek hêz û derdoran jî piştgriya xwe dan xuyakirin. Eger ev bang cihê xwe bibîne û gavên pêwîst bên avêtin, bandora wê tenê li Tirkiye û Kurdan nîn e, di heman demê de, wê bandoreke girîng li Rojhilata Navîn jî bike.

Weke ku tê zanîn dewleta Tirk bi hinceta PKK'ê û berxwedana gerîla, artêşa xwe mişextî Iraq û Sûriyeyê kir, herêmên berfireh dagir kir û baregehên leşkerî ava kir. Bi rastî jî şer û êrîşên xwe didomîne.

Ger banga Rêber Apo were bersivandin, herî kêm aloziya Sûriye û Iraqê bi dawî dibe. Niha gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rêveberiya Xweser nikarin bi HTŞ'ê re pirsgirêkên xwe çareser bikin. Astengiya vê jî Tirkiye ye. HTŞ'ê van danûstandinan asteng dike. Ji bo têkbirina Rêveberiya Xweser tenê bi êrîşkirinê re namîne û her wiha hewl dide HTŞ'ê êrîşî Rêveberiya Xweser bike û şer gûr bik e.

Çima Neteweyên Yekbûyî û hêzên navdar yên cîhanê piştgirî dan bangên Rêber Apo? Weke ku tê zanîn ev hêz heta niha jî bêdeng bûn. Li hemberî pirsgirêka Kurd û nakokiyan helwestên xwe yên nedîtî û ne bihîstî diparêzin. Ev ne ji ber wê bû ku wan pirsgirêk nizanibûn û ew ne girîng dihesibînin. Tirkiye jî bi endamtiya xwe ya NATO'yê zextê li DYA, Ewropa û saziyên navneteweyî dikir. Li gel ku li cîhanê tu kesî ji YPG û QSD'ê re terrorist ne hate gotin, lê Tirkiye her tim ji wan re digot terorîst û hewildida ku li ser raya giştî jî ferz bike. Nêzîkatiya tund a Tirkiyeyê û nîşandana hemû hêza xwe ya di vê mijarê de, di encamê de li wan hêzan xwe bê deng û bi paşde hişt. Kesî ji ber Kurdan nexwest bi dewleta Tirk re, rû bi rû bimîne û zirarê bide berjewendiyên xwe yên takekesî.

Di vê xalê de, êdî dewleta Tirk nikare bibêje kurd tune ne, her kes tirk in. Têkoşîna ku di pêşengiya PKK'ê de pêş ket û nêzî 50 salan dom kir, ev tine ne hesibandina gelê Kurd vala derxist. Hemû cîhan hişyar bû û bû şahidê gelê Kurd û berxwedana wan. Di vî warî de dema ku rayedarên tirk di tengasiyê de diman, wisa digotin "Dijminatî û pirsgirêka me bi kurdan re nîn e, em li dijî terorê têdikoşin" û li ser têgîna terorê sekinîn. Ev nêzîkatî di bingeha xwe de dihat wateya înkarkirina hebûn û mafên gelê Kurd. Pirsgirêka dîrokî ya 200 salî dihate ser ziman û di têgîna terorê de dihate pênase kirin. Dewleta Tirk bi van polîtîkayan xwe ji çareserî û pêngavên di vî warî de girtibû.

Yek ji sedemên herî girîng ên ku Erdogan di sala 2015'an de maseya muzakereyê hilweşand mijara Rojava bû. Erdogan got, "Rojava wê nebe xwedî statu, ev xeta me ya sor e." Rêber Apo bersiv da, "Rojava jî xeta me ya sor e." Li piştî wê şer bi awayekî xwîntir û dijwartir destpê kir. Rojava bû armanca êrîş û dagirkeriyê. Tirkiye, ne tenê di nava sînorên xwe de, li derveyî sînorên xwe jî bidestxistina statuya Kurdan weke pirsgirêka xwe ya ewlekariyê dît. Statuya ku li Başûrê Kurdistanê hatibû bi dest xistin jî, tu carî ev ne pejirandin. Erdogan gelek caran gotiye, em ê xeletiya ku me li Bakurê Iraqê kir, li Sûriyê dubare nekin.

Rêveberiya Erdogan hewildan kir ku hemû êriş û xirabiyên xwe bi navê PKK'ê rewa bike. Ji ber ku DYA û welatên Ewropayê PKK di lîsteya xwe ya rêxistinên terorê de bi cih kirine, Tirkiyeyê ev yek bikaranî. Şaredarî desteser kir û bi hezaran kesayetên siyasî, rewşenbîr û xebatkarên çapemeniyê xistin zindanan. Li hundir û derve bi hezaran mirov hatin qetilkirin. Tenê hinceta PKK'ê û terorê hebû û her tim xwe li pişt wê digirt. Di vî warî de Rêber Apo xwest vê hincet û çekê ji destê desthilatdarên Tirk bigire. PKK'ê rola xwe lîst, înkar şikand, pirsgirêk derxist holê û anî qonaxa çareseriyê. Her wiha bi gerîlatî û têkoşîna çekdarî jî rola xwe lîstiye. Di peymanan de mijarên weke aştî û bêçekbûnê di dawiyê de derdikevin pêş. Lê belê Rêber Apo di banga xwe ya dîrokî de tişta ku divê herî dawî hatiba kirin, di destpêkê de anî ziman. Di çareseriyê de însiyatîfa xwe bi kar anî. Hincetên weke PKK terörîste, ji destê rêvebirên tirk girtin. Di rastiya xwe de Rêber Apo dewleta Tirk bê çek kirin.

Ger pêvajo neyê asteng kirin, darbe û provokasyon neyên kirin dê şer bê sekinandin. Ev ê Rojava û Sûriyê rehet bike. Ji bo Sûriyê jî dê bibe destkeftiyek mezin. Tirkiye ewqas zextê li HTŞ'ê neke, li pênaseya rast neçar bimîne êrîşên xwe bide sekinandin. Ger ev yek pêk were, Rêveberiya Xweser dê pirsgirêkên xwe bi riya guftugoyan bi Şamê re çareser bike û rê li ber demokratîkbûna Sûriyê veke. Hin derdor însiyatîfa Rêber Apo tam fêm nakin, hin jî bi zanebûn wê berovajî dikin. Operasyonên tevliheviyê jî hene. Ji destpêkê ve Rêber Apo alîgirê çareserî û demokrasiyê ye. Şerên rizgariya neteweyî yên klasîk û çareseriyên wan rexne kir. Çareseriyên dewletparêz li aliyekî hişt. Kesên ku meraq dikin ka ev pergalekê çawa di parêze û li ku derê li çareseriyê geriyaye? dikarin parastina wî ya pêncemîn, pirtûka "Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk" bixwînin. Kesî nekarî PKK û gerîla têk bibe û çi têkçûn li holê nîne. Berovajî vê yekê înkar hatiye têkbirin û ji pirsgirêkê re çareserî hatiye dîtin. Rêber Apo jî projeya xwe ya çareseriyê bi perspektîfa Neteweya Demokratîk pêşkêş dike.

## Nexşerêya serdema nû



**Farûk Sakik**

Di 27'ê Sibatê de dema Rêber Apo ew banga xwe ya dîrokî kir, êdî di dîroka siyaseta Kurdan de pêvajoyek nû destpê dike. Êdî wê tu tişt wek berê nebe.

Tevgera azadiyê-PKK'ê di 52 salên têr û tije de Kurdistan azad kiribû. Kurdistan ji red, înkar û asîmlasyonê rizgar kiribû. Noqte. Em nakevin detayan.

Madem Kurdistan Azad bû çima şer dewam kir?

Rêber Apo di peyama xwe de bersiva vê jî da û bal kişand ser têkoşîna salên 90'an û got: Me hewl da ku em vê pirsgirikê di wan salan de çareser bikin lê hin hêz li pêşiya wê bûn asteng. Wan ji şer sûd digirtin. Kurd jî ji ber wê ketin pozîsyona xwe parastinê. Kurdan bi pêşengiya Rêber Apo û PKK'ê hem xwe parastin hem jî dixwastin di mejiyê dewleta Tirk de dijmintiya Kurdan paqij bikin. Dixwestin, Tirkiyê vegere kodên berî Lozanê. Dixwestin, Kurd û Tirk bi hev re di nav aramiyê de bi awayek azad bijîn. Dixwestin ziman û nasnameya Kurdan di fermiyetê de were nasandin û bi qanûna jî ev yek were mîsoger kirin. Rêber apo bi vê bangê digot van yekan êdî ne bi çek, bi siyaseta demokratîk wê pêk werin.

Heta roja me Kurdan di siyaseta demokratîk de gavek davêt, dewletê digot; Ev gav bi terorê re têkîldare. Êrîş dikir û pêşî lêdigirt. Rêber Apo bi vê hemleyê dixwaze vî çekî ji dest wan bigire. Rêber Apo dixwest ji çeka dest gerîlla zêdetir çeka dest dewletê ya li dijî siyaseta Kurdan bikartîne ji dest wan bigire. Vê nêrîna xwe bi Dewletê jî da kanî-îkna kirin. Salek li ser nexşerêyek xebat hebûn. Hin kesayet-profesor-akademisyen-dîroknas verêkiribûn gel Abdullah Ocalan û li Îmrali piştî nîqaşên kûr, gihîştibûn encamê.

Heyet hat avakirin da ku di navbera Rêber Apo û derve de bibin Pir. Bibin qasid Bibin dengê Rêber Apo.

Xebatên amedekariyê piştî demekê êdî, bi encam bûbûn û teqwîma ku dest nîşankiribûn ket pratîkê. Gava yekemîn: Rêber Apo bangî PKK'ê bikira. Di 27'ê Sibatê de ev yek pêkhat. Gava duyem: Bersiva tevgerê bû. Bi daxwiyaniyekê gotin; Emê ligor vê bangê tevbigerin û agirbest îlan kirin. Gava sêyem: Hemleya dewletê. Divê agirbest îlan bike û hêzên xwe yên eskerî ji Qadên Parastina Medya bikişîne da ku PKK'ê bi awayekê ewle kongreya xwe kom bike.

Gavên pêş: Li gor ku em dişopînin dewlet û Bahçelî li gor vê teqwîmê tevdigerin. Helwesta wan îşaretên li gor li hevkirina bi Rêber Apo re ne. Lê Erdogan li derveyî lihevkirinê tevdigere. Ew bi du desthilatdarî û serokomariya xwe ya pêşerojê ketiye. Zimanê ku nîjadperest pê dimijin bikartîne. Berjewendiyên gelan daye aliyekê, bi tenê li gor berjewendiyên 'Erdogan' tevdigere. Di destpêkê de hewlda ku li pêşiya vê hemleya çareseriyê bibe asteng. Lê evcar di vê pêvajoya çareseriyê de dewlet bi xwe hebû. Nikarîbû pêşî lê bigire û îroj dixwaze li gorî berjewendiyên xwe bikarbîne. Ji bo vê yekê jî zimanê ku bikartîne Kurdan dêşîne. Kurd ji xwe hestiyarin. Ji ber ku tevgera wan a 52 salan dawî li dîroka xwe tîne. Divê di serî de dewlet û hemû aliyên hemleyê, ji vê hesasiyeta wan rêz bigirin. Dema ku em li dijî vê yekê derkevin ev nayê wê wateyê ku li dijî serdema nû ne. Ji xwe Kurd bi Rêber Apo bawerin. Ji ber ku wî emrê xwe ji bo azadiya vî gelî da. Îro şûn de ji bo Kurd di nav lepên emperyalande neyên peliçiqandin nexşerêyek dayê pêş xwe.